# KILAMÊD CIMAETA KURDAYE GOVENDÊ



NÛRA CEWARÎ

JI BELAVKIRINÊN KOVARA MUZÎK Û HUNER-ê

BR.K.L.71

N.CEWARÎ



## 1- GULÊ HEY NABE




Gulê hey nabe, nabe, nabe,
Dînê -"-

Gulê, dil ketyê, çare nabe,
Dînê, -"-

Gulê, oronîk qayil nabe,
Dînê, -"-

Gulê, mala oronîk xirab be,
Dînê, -"-

Gulê, rêngeke rast e-dûz e,
Dînê, -"-

Gulê te'jîngê kûz e-kûz e,
Dînê —"—

Gulê, yek yar e, yek baltûz e
Dîne, —"—

## 2- DELÎL,DELÎL,XANA MIN






Wez şêmîkê,tu şêmîkê, — Delîl,delîl,xana min,
-"- — Tu bermalya mala min.

Wez sivderê,tu sivderê, — -"-
-"-

Wez heyatê,tu heyatê, — -"-
-"-

Çil zêr kutan ber kemberê, — -"-
-"-

Çil zêr kutan ber hêratê, — -"-
-"-

Wez ser xênî,tu ber dêr î, — -"-
-"-

Çil zêr kutan ber cênîkê, — -"-

3- YAR WERE




(Yar were,yar were Yar were tez helandim)2

Navê yara min Gulnaz e,
Yar were, yara min were, (A)
Dêrê ser da etlez e,
Yar were, tez helandim. (B)

Se'ra serî gevez e, (A)
Sibe ye tav qirqisand (B)

Se'la namilê toksîn e, (A)
Tûfliyê linga lûksîn e (B)

Sibe ye tavê daye, (A)
Tilyê min cavê dêra (B)

4- LÊ DÎNÊ




Lê lê dînê, lê dînê, lê dînê
Lê dîn, lê dîn, lê dînê, lê dînê(A)
Lê dîn, lê dîn, lê dînê, lê dînê
Mûşê çûme Tatûnê, narînê.(B)

Wez hatim te bibînim, lê dînê, (A)
Dê û bavê te min kîn in,lê dînê (B)

Wez hatim te bixwazim, lê dînê, (A)
Dê û bavê te min naz in, lê dînê. (B)

Gelenê par distînin, lê dînê, (A)
Xêrê gelen nebînin, lê dînê, (B)

Wez hatim alyê we da, lê dînê, (A)
Koç kerîya rê me neça, lê dînê, (B)

## 5- LEYLANÊ




Leylanê, çiya bû mij e, kuro,
Leylanê, bi hey Leylanê, (A)
Leylanê, çiya bû mij e, kuro, (B)
Kê cigo derdo bê derman?

Xezal tê kar cimije, kuro (A)
-"- (B)
Me baxa gul çirpandin, kuro, (A)
-"- (B)
Serê renga diçikandin, (A)
-"- (B)
Çil qeytan dorê kîsa, kuro (A)
-"- (B)
Çil fîncan dest ûrisa, kuro, (A)
-"- (B)

## 6- SÎNEKE




Sîneke wê bi çalê da,
Wey lo lolo lolo, }
Wey Nûbar, Nûbar. } (A)

Min jimart sed mal têda (A)
Cot zeryê porsor têca (A)
Gistîlka min tilyê da (A)
Navê şirîn qaşê da (A)

Sîneke kevrê reş e, (A)
Ceve tên sî û şeş e, (A)
Deva paşyê cimije, (A)

# 7- HERÊ RINÊ LÊ







Herê rinda min tevnek danî
Herê rindê lê, rindê lê, rinda min.(A)
Herê nexşê ortê gul danî,
Herê qira xurta ser anî,

Herê rinda min e sipik î,(A)
Herê tel quharê gupik î, (A)
Herê tel xizêma şirik î, (A)

Herê tel kofî barê gakî, (A)
Herê te mala min xirabkî,(A)

Herê rinda min e remoş î,(A)
Herê zermemika nafroşî, (A)

Herê dirfoçî tikirçî me, (A)
Herê nafroş, alançî me, (A)

## 8- HESPÊ MOMER




Hespê Momer reş e, hay Momer, hay Momer,
Meydanê hûr dimeşe kurxalê xalê min.

Hespê Momer sor e, hay Momer, hay Momer,
Meydanê dor bi dor e, kurxalê xalê min.

Hespê Momer boz e, hay Momer, hay Momer,
Meydanê radike toz e, kurxalê xalê min.

Hespê Momer şîn e,hay Momer, hay Momer,
Meydanê dibe tîne, kurxalê xalê min.

Rengeke rast e dûz e, hay Momer, hay Momer,
Tejîngê kuz e-kûz e, kurxalê xalê min.

## 9- HOYNAR




Hoynar, hoynar, hoynarê, Hoynar, hoynar, hoynarê,
Min çavê belek xarê, -"-
Têr nabim vê dîndarê, -"-
Xilas nabî vê carê, -"-

Navê yara min Emîn e, -"-
Bavê lê kir temîn e, -"-
Tu oewata hemî ne, -"-

Hoynara min hekak î, -"-
Tel guharê gupik î, -"-
Tel xizêma şirik î, -"-
Tel kofî barê gak î, -"-
Tu li mi ra malê nakî, -"-

## 10- ÇIL BEJNÎNGA




Çil bejnînga lê hatibû derda lê,

Bejnê lê, bejnê lê, bejna kê, (A)

Çil **bejnînga** lê hatibû derda lê,

Gelo lo, zerî li mala kê. (B)

Ez sabûna lê rabûm berda lê, (A)

-"- (B)

Min vê bejnê lê têr xeberda lê, (A)

-"- (B)

Çil bejnînga li ser xanînga lê, (A)

-"- (B)

## 11- ÎŞEV ŞEVA TE YE



Î -şev şe - va te ye



de tu ma - la me be

Îşev şeva te ye, de tu mala me be, )2
Balgyê mey qutnîyê wê berpala te be, )2
Kanya me hevraz e, wê şerbeta te be, )2
Dayka min rindik e, wê xasînga te be, )2
Bavkê minî kal e, wê xezûrê te be, )2
Birê minî biçûk wê bûrangê te be, )2

## 12- ZILFANÎ

allegro



Zil- fa- nî em ye - kin zil -fa- nî




Zilfanî, em yek in,
Bax û bostan serek in,
Zilfanî, Zilfanî,
Tu gula nav xurtan î.

Zilfanî, em cot in,
Bax û bostan kevotkin,
-"-

Zilfanî, em sê ne,
Bax û bostan hurmê ne,
-"-

Zilfanî, em pênc in,
Bax û bostan tirinc in,
-"-

Zilfanî, em şeş in,
Bax û bostan zebeş in,
-"-

Zilfanî, em heft in,
Her heft in,hespê rext in
-"-

13- YAR GUL Î

allegretto




Yar gul î, yar gul î, gul î, gul î, )2
Yar gul î, notla fenêr cis̭xulî, )2 (A)

Yar gul î, ez c̭ûm derî dadayî,)2 (A)

Yar gul î, qîzek têda paldayî,)2 (A)

Yar gul î, ramûsana wê xwes̭ e,)2 (A)

Yar gul î, c̭avê kildan res̭ e, )2 (A)

## 14- KEWÊD GOZEL




Em yek in, zerî yek in,
Kewêd gozel, kewêc gozel, yar yar, (A)
Eax û bostan serek in,
Kewêd kubar, kewëc kubar, yar yar. (E)

Em cot in, zerî cot in, (A)
Eax û bostan kevotkin, (E)

Em sê ne, zerî sê ne, (A)
Bax û bostan hurmê ne, (B)

Em car in, zerî car in, (A)
Bax û bostan hinar in, (E)

Em pênc in, zerî pênc in, (A)
Bax û bostan birinc in, (B)

## 15- LEYLÊ







Leylê, Leylê, Leylê xanê,
Leylê, Leylê, Leylê xanê, (A)
Leylê, Leylê, Leylê xanê,
Leylê, Leylê, Leylê canê. (B)

Bin cava da min dinhêre, (A)
-"- (B)
Barkin barê heft devan e, (A)
-"- (B)
Şerê deva ser kudkan e, (A)
-"- (B)

## 16- LO MIŞKO






Evî mişkî çi kir,çi kir,lolo lolo lolo.
Evî mişkî embar qulkir,Mîrikî mişkan e.
Evî mişkî tigrin tînin,lo lo lolo lolo.
Balte tînin hûr hûrikin,Mîrikî mişkan e.
Mêzînê tînin par-parî kin,lolo lolo lolo.
Rûvîya qetê para metê,Mîrikî mişkan e.
Rûvîya dirêj para dengbêj,lolo lolo lolo.
Rûvîya kine para min e,Mîrikî mişkan e.
Hûr û pizûr para xezûr,lolo lolo lolo.
Têxne tasê tidine Asê,Mîrikî mişkan e.

## 17- LÛRKE-LÛRKE









Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, Xanimê lûrke,
Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, Tolbavê çêke.

Kêrê bîne penêr hûrke, -"-
Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke,

Çûme mala Buryê Xişo, -"-
Danî ber min nan û tirşo,

Tirşo, tirşo, dilê min dişo, -"-
Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke,

Çûme mala Elyê Emer, -"-
Danî ber min qelîya qemer,

Çûme mala xalê bekir, -"-
Danî ber min heft pût şekir



## 18- SEYRANÊ







Sibe ye tavê daye,
De rabe hay, de rûne hay, de Seyranê. (A)
Zêrê enyê xudaye, (A)
Seyrana min çi rind e,(A)
Bejna xwe da bilind e,(A)
Mala wê orta gund e, (A)
Seyran e pir delal e, (A)
Ez hatim te bixwezim, (A)
Bavê da,birê neda, (A)



## 19- XEZALA MIN

allegro




Xezala min, delala min, Hay êrî, êrî, êrî
Şivana pez da bêrî.
-"- Ez zanim tu malmêrî,

-"- Konê bavê te çît e,
Jinê anî kilît e.

-"- Konê bavê ta ye,
Ser ra kock sera ye,
Bejna revî bela ye.

## 20- HA BI DAR E




Ha bi dar e, ha bi dar e, ha bi dar e,
Lê lê lê lê lê lê lê lê, Xana min. (A)

Nav dara girt hinar e, (A)

Topa min, terlana te, (A)

Derdê min ya xwendkar e, (A)

Xanîngo, dermezino, (A)

Lê derket qewşe bûko, (A)

Derdê min ya mezino, (A)

Xanîngo, derbiçûko, (A)

Lê derket qewşe qîzo, (A)

Derdê min ya biçûko, (A)

## 21- HOYNAR, HOYNAR




Hoynar, hoynar, hoynarê, hoynarê,
Hoynar, hoynar, hoynarê, rihanê. (A)

Hoynara min çi rind e, hoynarê, (A)
Bejna wê da bilino e, hoynarê, (A)
Mala wê orta guno e, hoynarê, (A)
Ez hatim te bibînim, hoynarê, (A)
Dê û bavê te min kîn in, hoynarê,(A)
Qelenê par distînin, hoynarê, (A)
Ez hatim te bixwazim, hoynarê, (A)
Dê û bavê te min naz in, hoynarê,(A)
Ez hatim alyê we da, hoynarê, (A)
Koç kerîya rê me neda, hoynarê, (A)

## 22- ÇAVBELEK




Çavbelek, tu min helal bî,
Notla dimsê hîzîn bî,

Notla şekir şîrîn bî, çavbelek tu min helal bî.

Taştîya pala gundîya bî, -"-

Şekirê ser lêvê min bî, -"-

Xeleqa ser mala bî, -"-

23- ZERYÊ




Hercke solê wan sor e, zeryê, zeryê,
-"- dotmamê min xulamê.

Ringe-ringa siyara tê -"-
-"-

Dengê sol-tizmara tê, -"-
-"-

Zerî mala berjêr cû, -"-
-"-

Dilkê xurta xuva cû, -"-
-"-

Sola daynin em rabin -"-
-"-

Derê dêrê kirkirke, -"-
-"-

Kirkirka cirke-cirke, -"-
-"-

## 24- QAZÊ LÊ




Qazê lêlêlê,başê lêlêlê,ha rê ye,rê ye,rê ye.

-"- Wê peya wê da têye.

-"- Ew peya mala kê ye?

-"- Wê siyarek wê da têye.

-"- Ew siyara mala kê ye?

-"- Ew siyara mala me ye.

25- SÎNÊ




Sînê, Sînê, Sînemê, Sîne, Sînê, Sînemê,
Sînê, Sînê, Sînemê, Pişt kutaye kemberê.

Sînê mala berjêr çû, -"-
Dawa cêra bela çû,

Sibe ye tav zeriqî, -"-
Zêrê enyê biriqî,

Sînê qîza keşîş e, -"-
Cêbek tijî kişmîş e,

Sînê qîza mele ye, -"-
Cêbek tijî kele ye,

26- FÎNCANÊ




Hewar,hewar Fîncanê, Hewar,hewar Fîncanê,
-"- Medet,kawa min kanê?

Fîncan birine dîwanê, -"-
-"-

Gelo gune çî danê? -"-
-"-

Du sitekan wê av danê, -"-
Şê -"-

Yanga paşin çay danê, -"-
-"-

## 27- LO DILO




Lo dilo, lo dilo, lo dilo yeman,
Lo dilo, lo dilo, lo dilo yeman. (A)

Ha li me çûne sal û zeman, (A)

Kalê me çûn, cahilê me man, (A)

Papaxreşa lo, keç tê´neman, (A)

Lo dilo, lo dilo, dilkê karê, (A)

Agir ketîye koka darê, (A)

Agir ketîye koka gihê, (A)

Sed kulmalo lo şivano, (A)

## 28- DÎL IM DÎLBER




Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
dîl im dîlber, dîlberê,
Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
sibe ye tavê daye.

Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
zêra enyê xû daye,
Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
Çavkêm, dilkêm lê maye.

Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
Sibe ye tav zeriqî,
Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
zêrê enyê beriqî.

Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
Sibe ye tav qirqişî,
Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
ser xanya bûne tijî.

Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
dîl im halê Kawê ye,
Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
kirasê Kawê çitî ne.

Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
bejna te ye reqet î,
Dîl im dîlber, dîl im dîlber,
şîrîn mîna şerbet î.



## 29- ELEGEZ ŞÎRÎN E

allgro




Elegez şîrîn e,
Nîno, Nîno, Nîno, Nîno, Nîno, Nîno, (A)
Elegez şîrîn e,
Ximximê-tolkbavê, dezmala ser destan e.(B)

Şemo diqîrîne, (A)
-"- (B)
Peza jor da tîne, (A)
-"- (B)
Nîno sêlê tîne, (A)
-"- (B)
Dendka diqelîne, (A)
-"- (B)
Para xwendîya dişîne,(A)
-"- (B)

## 30- LO DILO, DILO




Lo dilo, dilo, lo dilo, Lo dilo, dilo, lo dilo,
Lo dilo, dilo, lo dilo, Sêfîlo dilo, sorgulo.

Emê îsev li ku ban, -"-
Ha li ser para Qerê bin,

Site ye,site nav e, -"-
Site ye,site nav e,

Zerî raza,ranabe, -"-
Zerî raza,ranabe,

Dil ketye, çare nabe, -"-
Dil ketye, çare nabe,

Sibe ye tavê daye, -"-
Sibe ye tavê daye,

Zêra enyê xudaye, -"-
Zêra enyê xudaye,

## 31- TENCOLÎ




Tencolye, tencolî kir,
Delalê,delalî kir.

Tencolya qîza xalê,
Emîsê nan qezmalê.

Xudêyo, bêyo, têyo,
Xudêyo, baran bêyo.

Tencolyê rakine pêyo,
Têr bibînim vê bejnêyo.

Tencolyê kexmek lêyo,
Vê bi kexmê cêvek lêyo.

Vê bi gezê morek lêyo,
Vê bi morê navek lêyo.

32- HOY LELE

allegro



Hoy lele, hoy lele, Ha bi rûvî me, ne şêr im,
-"- Xwe di qulê da vedişêrim.

-"- Xasînya min e dimdimî,
-"- Ber kulînê sekinî.

-"- Kulîn ser da hedimî,
-"- Boçik ber da qurçimî.

-"- Sibe ye ba tê ji pêra,
-"- Şimaqî da ber zêra.

-"- Tilyê min çavê dêra,
-"- Çi mêr dî, qîz da jê ra.

-"- Ez çûm derî dadayî,
-"- Derî zerze venabe.

-"- Keçik xewê ranabe,
-"- Mala qomsî xirab be.

33- KELEŞO






Keleşo, nobedaro, wey lolo, lololo, wey lolo,
-"- ya dilê min, emrê te.

Şev yek e, diz hezaro, -"-
-"-

Canûnga, rexte, rişme, -"-
-"-

Kuriko, pirê yek e, -"-
-"-

Cot kevrê mermer lêke, -"-
-"-

Navê min, xwe ser lêke, -"-
-"-

# S E R E C E M

Ji strana 1-10 ji devê Jênîka Ûsib, 13 salî, şagirta dersxana şeşa, ji gundê Elegezê ser nehya Aparanê.

Ji strana 11-22 ji devê Kubara Xudo, ji gundê Elegezê, li ser nehya Aparanê, 17 salî, şagirta dersxana neha.

Ji strana 23-26 ji devê Tamara Siabend, ji gundê Elegezê, li ser nehya Aparanê,19 salî, xebatçiya mektebê têxnîkîê.

Strana 27 ji devê Çiçeka Cemal, 13 salî, ji gundê Pampê, li ser nehya Aparanê, şagirt.

Ji strana 28-31 ji devê Rostemê Pele, 19 salî, binelîê bajarê Tbîlîsîê, şagirt.

Ji strana 32-33 ji devê Kamilê Xelîl, 18 salî, xwendî, binelîê bajarê Tbîlîsîê.

## PAŞGOTIN

Ji folklorvanan ra!

Huner jîn e,
baş e ger fêrî hevdû bikîn!
Dema vejandinê ye,
qencîyeşertiştek biparêzîn!
Rast e ku,
hatîne cîhanê û wek hemyan jî dimrîn,
lê bi rûspî û serbilindî...
Emê her dem bijîn û bijîn...
Dostan! Evîndaran! Karên me hergîz namirin!
Teqez ji me ra sed aferîn...
Bila bijî huner, her dem bi aştî,
ji bo jînê, tijî bi evîn!!!

Beşîr Botanî

cenga birakujî 1983

ÇAPA DIWÊ , SWÊD I983

KV-Studieförlaget repro
Uppsala 1983